



Australian Government

COVID-19
✓ **VACCINATION**

Hemlebûyînî/dûcanî, Şîrdayînî û vaksîna COVID-19

Ji bo jinên bihemle û ên şîrdanê didin û ên pîlanên wan bo bi hemle bimînîn vaksîna Comirnaty (Pfizer) û Spikevax (Moderna) têye pêşniyar kirin. Jin di dikarin di her heyama bihemletiyê da vaksînê li xwe bidin.

Rizqê ciddî, ên netîcên negative ango nerînî ji ber COVID-19 bilintir e ji bo jinên bi hemle û zarîyê wan ên newelidî. Jinên bi hemle ên bi nexweşîya COVID-19 dikevin rizqek bilin ê hewcetîya çûyîna nexweşiyê an hewcetîya midahla lênehrînek bişijkî li gel xwe tine. Îhtîmalek gelek kêr heye ku zarokê wan ê hê newelidî berî dewra xwe bêne dine (berîya welediyê 37 hefên bi hemlebûyînê) û pêwistîya çûyîna nexweşxanê bo lînehrîne. Vaksînêdan şansê tevliheviyên wekî zayîna pêşwext, jidayikbuna zarok a mirî, piçûkmahîya laşê pitik/zarok û seqetmayîna pitik dema zayîne da zêde nake.

Vaksînbûyîn rêya herî qence bo kêbkirina xerteran/rizqan. Wê hewcedarî bi dosên vaksîna Pfizer ku ew di navbeyna sê heya şeş heftan ji hevdûr were lîxistin, an dû dozen vaksîna Modernayê bi şeş hefte ji hev dûr.

Delîlên di derheqa ewlehîya COVID-19 di dema bi hemlebûyînê da ên welatên din tene bidest xistin. Peyam dîyardikin ku bikaranîna vaksîna Pfizer ji aliyê jinên bi hemle bi ewle ye. Lêkolînek li YA a kû di nava 35,000 jinên bi hemle/dûcan hatîye pêkanîn dîyar dike ew bondorên hesasîyetê bo jinên bi hemle û ne-bihemle her wekhev in.

Emê bi berdewamî şîretên xwe nû bikin dema gahiyên di derheqa COVID-19 li ser jinên bi hemle ku bidest ketin.

Piştî wergirtina vaksîna COVID-19 di wexta bi hemlebûyînê de wê çî derîmkanên bandorên hesasîyetî tê dîtin?

Piştî lîdana vaksînên COVID-19 ew hesasîyên hevpar ev in:

- agir/ta
- êşa mil
- serêşî
- êşa masûlan
- êşa movikan
- sarbûn.

Heke ji van hesasîyan yek ji wan piştî vaksînê bi were peyda bû, hûn dikarin hebên paracetamol (hebên êjkûjînê) bixên ji bo ev hesasîyetên hevparîn kêmbibin. Paracetamo di her heyamên bi hemblebûyîna da bi ewle ne.

Lêkolînên li seran ser cîhanê hatine kirin bi taybetî di nav jinên bi hemle û zarîyên wan rastî peydabuna tû hesasîyet nehatin e. Lêbelê dibe derîmkane ku henek hesasîyetên kêmbatî dîtî hê ji aliyê lêkolîngeran de nenatine dîtî.

Gelo di dema bi hemblebûyîna ku ez vaksîna COVID-19 li xwe bidim wê feyda wê ji bo piçûkê min ê newelidî hebe?

Jinên bi wana re COVID-19 hey rizqek bilin e ku zarokê wan mîrî an (berî dewrê) werin dinyê. Wê zarokên wan ji di dema zayîna da zahmetî bo wan peyda bibe, an wê hewcê wan bi midahlek lêrenhnîya acîl a pisîjkîyê li beşê nexweşxanê hebe.

Vaksînlêdan rêya herî baştîre bo kêkmirina van rizqan/talûkan.

Delîlên zanistî destnîşan dikin ku antîpîdên ku ji hêla jinên ducanî ve hatine bikaranîn piştî vaksîna COVID-19 dikarin derbasî plasenta bibin, nemaze bo ew jinên di destpêka ducanîyê de hatine vaksînkirin û yê berî zayîna piçûkê wan ên herdû dozên li xwe dabî. Van antîpîdan dibe kû piştî bûyîna zarok çend mehan parêzîyek li hember COVID-19 bide jîyana wan.

Çi pêşniyari bo ew jinên ku şîr didin zarokên xwe têye kirin?

Pfizer û Moderna ji bo jinên kû şîr didin zarokê xwe têye pêşniyarkirin. Hûn dikrin berdewam bin bî sîrdayîna berî an jî piştî vaksînlêdanê.

Pêşniyari bo jinên kû plana hewildayîna bi hemelemayîna dikin çin e?

Pfizer û Moderna ji bo jinên ku plana hewildayîna bi hemelemayîna dikin ji dinav de tê ye pêşniyar kirin. Vaksîlêdana berî bi hemle mayîna tê vê wateyê ku hûnê di seranserê ducaniya xwe de li hember COVID-19 werin parastin. Ji kerema xwe haydar bin wê:

- Ne hewce bi hemelemayîna berî an ji piştî vaksînlêdana COVID-19 dût bisekin.
- Vaksîlêdan bandore li zayîna/zarokbûyîna nake.
- Gelo hevcê we berî vaksîlêdanê ji we nayê xwestin hûn testa/temrîna ducaniyê bikin.

Bo agahdariya zêde

Ji bo bizanibin li kêderê hûnê bikaribin vaksîna COVID-19 li xwe bidin, serdana vir bikin <https://covid-vaccine.healthdirect.gov.au/eligibility>

Heke pirsek we di derheqa vaksînen COVID-19 hebe, bi diktorên xwe re bipeyîvin, serdana vir bikin health.gov.au/covid19-vaccines-languages, or li ser vê hêjmarê 1800 020 080 pêwendî bi Xetalîkarî ya Netewî a Virûsa Korona re girê bidin.



Bo kargûzarîya tercûmanîyê, banga 131 450 bikin.